# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (232) | Çirya Paşîn / 1-11-2022


# «Biryara çûna Pêşmerge ji bo Kobanê dîrokî bû, û ti carî ji bîra Kurdan naçe»




**Kurdistan**

Roja 22ê Çirya Pêşîn 2014an, Parlamentoya Kurdistanê li ser daxwaza Serok Barzanî, ji bo gotûbêjkirina rewşa Kobanê civiya. Di civînê de, Parlamantoya Kurdistanê bi yekdengî daxwaza Serok Barzanî ya ji bo şandina Pêşmergeyan bo Kobanî û alîkariya Kurdên Kurdistana Sûriyê bi awayekî fermî pesend kir. Roja 28ê Çirya Pêşîn 2014an, yekem karwana hêza Pêşmerge ku hejmara wan 150 Pêşmerge bû, bi çekên sivik û giran bi 40 otomobîlên leşkerî ber bi Kobanê ve bi rê ket û bi dirêjahiya rê ji Başûr, Bakur û heta gihîştina Kurdistana Sûriyê, welatiyên Kurd bi ala Kurdistanê, sirûda niştimanî, çepik û tilîliyan pêşwazî li hêza Pêşmerge kirin, ji ber ku bi nêrîna Kurdên her çar perçeyên Kurdistanê, şandina hêza Pêşmerge bo Kobanê, bûyereke dîrokî bû. Herwiha şandina hêza Pêşmerge bo Kobanê, karvedaneke navdewletî jî li pey xwe anî û beşeke mezin a medyaya cîhanê rûmala çûna Pêşmergeyan di nava xaka Bakurê Kurdistanê re bo Kurdistana Sûriyê kirin. Bi gihîştina hêza Pêşmerge re, balansa şer hat guhartin û di demekê de ku tenê ji sedî 20 ji Kobanê di destê Kurdan  de mabû, Pêşmerge û şervanan mil bi mil hev girtin û Kobanê ji metirsiya ketinê rizgar kirin.

---


**Ferzkirina bacan li Efrînê barê welatiyên Kurd giran dike** *Rûpel—2*

**Zimanê Kurdî di navbera qedexekirin û fêrkirinê de** *Rûpel—3*

**Qado Şêrîn pirtûka “Mihemed Şêxo Huner û Jînenîgarî” belav kir** *Rûpel—4*

# Ferzkirina bacan li Efrînê barê welatiyên Kurd giran dike

**Kurdistan**

Desteya Tehrîr El-Şam û grûpên hevpeymanên wê Sultan Silêman Şah û Hemzat baca zekatê li ser zeyta cotkarên Efrînê zekatê ferz dikin. Çekdarên opozîsyona Sûriyê yên ser bi Tirkiyê ve, bi ferzkirina bacan li ser xelkê Efrînê û dizîna berhemên zeytûnan berdewam in. Desteya Tehrîr El-Şam ku nêzîkî du hefteyan e ji derbasî Efrînê bûye û dest danîne ser gundên Efrînê, di bin navê zekata zeytê de bac li ser xelkê Efrînê ferz kirine. Xelkê Efrînê jî dibêjin ku tawan û binpêkirinên mirovî kêm nebûne û her dizî, talan, ferzkirina bacan û qutkirina daran berdewam in û ti cudahiyê di navbera Heyet Tehrîr el-Şam û grûpên Artêşa Niştimanî ya opozîsyona Sûriyê de nîne. Li gorî çalakvanên Efrînê, çekdarên Desteya Tehrîr El-Şam bi hevahengiya ligel koma Sultan Silêman Şah (Emşat), baca 5 % ji berhema zeytûnan di bin navê "zekatê" de li gundên Şekatka, Erendê, Mistika û Kêla yên navçeya Şiyê sepandine. Her li navçeya Şiyê, çekdarên Sultan Silêman Şah jî, baca 5 dolar li ser her dareke zeytûnan li gundiyan ferz kirine. Her wiha çeldarên grûpa Emşat li gundê



Erendê yê li navçeya Şiyê, berhemên 200 darên zeytûnan dizîne. Li navçeya Cindirêsê, çekdarên Firqeya Hemzat baca diravî li ser cotkaran gundên navçeya Cindiresê ferz kirine. Baca % 50 li ser darên koçberên Efrînê û % 25 li ser cotkarên li gundê xwe mane ferz kirine. Her li wê navçeyê, berhemên 50 darên zeytûnan hatine dîzîn û 10 darên jineke ji gundê Yelanqozê hatine qutkirin. Li navçeya Raco, grûpa çekdar a bi navê Mihemed El-Fetih a ser bi opozîsyona Sûriyê ve, baca nîvê berhema zeytûna li ser cotkarên gundê Memila yê navçeya Raco ferz kirine. Li navçeya Mabeta jî, çekdarên grûpa Siqur El-Şemal berhema nêzîkî 800 darên zeytûnan li gundên Kamrûk û Evrazê yên li navçeya Mabeta dizîne.

# Êdî bese em bibin alav û pir ji serdest û neyaran re



Azad Haco

Bi tenê dema bûyerek qezencî bûnê rû dide an bierjwendî bên xwestin yan helbijartin nêzîk dibin seranserî dewletê Kurdistan dagîr kirine tu di şopîne bê çawa partiyên wan dewletên serdest an partiyên rêkber dikevin nava liv û tevgerê û kurd têne bîra wan zû jibîra wan dere sitem û pîlanên ku li serê kurda di kirin bilez berê xwe didin deverên wan bi karwana bi riwekî guherîn û girnijî hevdîtina bi wan re dikin da ku wan razî bikin û bi alî xwe ve bikişînin ji xwere bikin piştevan di doz an pêşbirikan de yan dengên wan qezenc bikin di helbijartinan de dibin hin dirûşim siloganên pirr pa'n û piropegendên bi niyaz genî û xirab veşartî û xapînok û soz dayînên bi vir û derew heya dighên merema xwe ya xwstek û biser dikevin dibin desthilat û postên ast herî bilind di dewletê de bi dest dixin demlidest ji wan soz û hevtêgiheştinên xwe ve bi paş ve dikşên û nema tişkî kurda tê bîra wan jibîr dikin dilpakî û wefadariya kurda bi wan re ku bi saya dengên wan bûne desthilat û ne ev tenê ayet berovajî dibe û diyariya wan jibo wê wefadariyê vegera wan liser bi karanîna karên çewit û xirab ên berê der heqê kurda mîna çavsorî û sitem û zor destî ku li wan bikin dîsan eha evin neyarên me kurda ên rasteqîn ji lewme dibê em kurd li xwe vegerin û haydar bibin em bes bibin kêra destê wan neyarên xapînok ku wek alavekê wexta bê xwestin me bi kar bînin em bes bibin pirra ji wan re ku pêlmekin û bighên cihê ku dixwazin gerek em ji ezmûnên xwe ên berê bi wan re fêr bibin û bes wan şaştiyan dûbare biikn em baweriya xwe bes bi wan û gotinên wan bînin tê xwestin em baweriya xwe bi xwe bînin bi layen û partiyên xwe kurda bînin û xwirt bikin em dengê xwe bidin wan û wan bi serxînin ku ew jî bibin xwedî biriyar û desthilat li himber wan neyaran kar û xebata xwe bi domînin bi zanebûn û hişmendî heya em azad bibin û mafên xwe yên rewa bi destxînin û bibin xwedî sitato em ji wan û qirêja wan dagîran qurtal bibin em xwe bi xwe bi rê ve bibin wek her miletekî serbest û azad û welatê xwe ji nûve nûjen û geşdan bi ber ava kirinê ve bibin da em û nifşên bên bi serferaz û rûmet li xaka bav û bapîrên xwe bijîn dibin sîbera ala Kurdistanê de.

# Zimanê Kurdî di navbera qedexekirin û fêrkirinê de



Ebid Elî

Bê guman, ziman ne tenê alavê axaftin û têgihiştinê ye, belê yek ji sitûnên sereke yên hebûn û nasnama gelane, kilîta embara dîrok, çand û keltore,vîzeya avjeniyê ye di deriya zanest û bîreweriyê de. Rola ziman di jiyana gelan û komelgehan de gelekî giring û pêwîste. Zimanê Kurdî jî weke zimanê her miletê cîhanê roleke wî ya berçav di jiyna gelê Kurd de heye, ji lewra qedexekirina xwendin, nivîsandin û ta axaftinê jî bi Zimanê Kurdî weke yek ji alavên sereke di bişaftin û tinekirina milatê Kurd e ji bal rêjîmên dagîrker ve hatiye bi karanîn, û miletê Kurd jî diber zimanê xwe de tûşî girtin, zindan, û lêdanê bûye. Ev rastiyeke dîrokî ya berçav û diyare, lê rastiya dîjî ewe ku Zimanê Kurdî çekeke xurt û dijware di berxwedana gelê Kurd de. Miletê Kurd bi riya helbest,sirûd,çîrok û serpêhatiyan zimanê xwe parastiye û liser lingan zindî maye, digel hemû cureyên gef, fişar, astengî, û şeran. Vêce gelo tu yê çawa miletê ku li hember gef û fişarên wisa mertirsîdar liber xwe daye, û diber zimanê xwe de tûşî ewqas êş û azaran biwe,bi mehna parastina zimên wî siza bidî û dergehê zanebûn û xwendinê li ber wî dabixî?

> Parastina ziman ne bi kotekî û windakirina pêşeroja zarokan e

Belê parastina ziman ne bi kotekî û serkutkirina milet û windakirina paşeroja zarokên wî ye. Ziman ji mafê her gel û netewiye, ji lwera ziman jî weke her mafekî bi kotekî nayê dayin lê bi kotekî tê sitandin, ango pêwîste kotekî li deshelatê bibe,jibo danpêdanê bi zimanê kurdî bi de, yan jî bi karê diblomasî û konevanî, ku weke erkekî netewî û rêxistinî di program û rêbazên tevgera Kurdî de hatiye, û bi kiryar jî tê şopandin. Bi sedan fistîval,kors û simînarên piştgirtin û fêrkirina Zimanê Kurdî ,bi sedan xule ku her yek bidehan şagirt û qutabiyên zimanê kurdî li xwe digire di kawdanên sext û dijwar de hatine li darxistin û hêjî berdewamin. Yek firset ango yek derfet ku xizmeta Zimanê Kurdî bike me ji dest xwe neberdaye û pişt guh nekiriye, her rê ya ku xizmeta xwert kirin û pêşxistina Zimanê Kurdî bike çiqasî dijwar û sext jî be bê dudilî me daye ber xwe, lê ev tişteke û girêdana zarokên me bi rêbazeke xwendinê ya edyolocîkirî, bê sûde û mifayekî zanestî tiştekî dî ye. Girtina xwendingeh û dibistanan bi mehna parastina Zimanê Kurdî yan jî bi mehna rêbazên rêjîmê mehnene çewt û derewin, xizmeta parastina Zimanê Kurdî nakin. Girtina peymangeh, xwendingeh û dibistanan çewisandin û vemirandina çirûskên zanistiyê ye, kilîtkirina dergehên şarezayî, zanebûn, û bîreweriyê ye, sizadana milete, û doz û daxwaziya berdewamiya peymangeh û dibistanên taybet yên ku bi rêbaza rêjîmê xwendinê di din jî ne xwedûrxistine ji erkê netewî, ne hezkirina rêbaz û ramanê polîtîkî yê rêjîmê ye, lê belê bi sedema giringî û pêwîstiya, gel, civak, û welat bi zanebûn û zanestiyê ye, fêrkirin û fêrbûn bi çi zimanî be li kîjan cihî be yasayî ye û ji mafê her mirovekî ye. Xizmeta komelgeh û civaka Kurdî bi mikomkirin û xurrtkirina Zimanê Kurdî, bi pêkanîna lêvegerên zanistî yên ekadimî, bi damezirandina navendên lêkolînan, digel dabînkirina paşerojeke ronak ji xwendevanên Zimanê Kurdî re di be.
parastina ziman bi heskirina ziman tê, ne bi qedexekirina fêrkirina zanestê ku bi çi ziman be.

> Girtina peymangeh û dibistanan vemirandina çirûskên zanistî ye

Derixistina ferman û biryarên taybet bi civaka Kurdî, ku kesê Kurd bi tenê qelenên wan bide, beryarin şofîn û nijadperestin ji kê be yan li kû be û bi çi mehne û sedemê be, nexasim ku jibal desthilatdarekê be ku xwe dike (netewa demoqraîk) ango ji riwê netewî ve bê alî ye. Gelo çawa tu bê alî ye û fermanên taybet bi yek alî dide?. Çawa tu xwe li ser netew û miletan re dibînî û fermanan bi kotekî li ser beşekî ji civakê li ser bingehên regezî di çesipînî?!. Sedma van biryar û fermanan ji me ve xuya ye ji lewra li cem me ne cihê vecniqandin û matmanê ye, belê ew piropagenda reş ya li dijî red kirin û ne pejirandina van beryaran, weke ku gunehekî mezin be, ji bal kesin ku liser rewşenbîr û ekadimiyan tên jimartin derdikeve, nexasim yên ku zarokên xwe di ekadimiyetên navdewletî yên navdar de didin xwendin û ji me di xwazin ku em li (bercewendiya xwe ya kesayetî ?!) ne gerin, (pêşmerge û cangorî?! ) bin, paşeroja zarok, nevî, û çendîn nifşên xwe gorî ( xizmeta zimanî kurdî ??!!) bikin, cihê gumanê ye??!!. Em di xizmeta kêşe û zimanê kurdî de ne û emê berdwambin di xizmetê de, lê em xwendina edyolocîkirî ku bê sûd û mifa ye na pejirînin, em dê li zanest û zanebûnê bigerin û bi wergirin li kû be û ji kê be.

# Qado Şêrîn pirtûka «Mihemed Şêxo Huner û Jînenîgarî» belav kir

**Mahir Hesen-Elmanya**

Nivîskar Qado Şêrîn pirtûka xwe ya li ser hunermendê navdar Mihemed Şêxo belav kir. Qado Şêrîn ji Rojnameya Kurdistan re got: Jînenîgariya Mihemed Şêxo pirtûkek vekirî ye, bi dawî nayê, wê tim tiştên nû derkevin, ji ber Mihemed Şêxo di demên cuda de, li gelek welatan geriya û ma û jiyaye.

*Di destpêkê de em dixwazin Qado ji nêzîk ve nas bikin?

Pirsa zor a ku nikarim bi hesanî bersivan jê re bibînim. Zor e qala xwe bikim, lê dizanim ji Qamişlo me, 29 sal in li Hollenda dijîm û hîn carekê jî venegeriya me welêt, dizanim ezê di tabûtê de vegerim, ewê jî baş be, lê mixabin ezê nikaribim derûdora xwe bibînim. Kurteçîrokê dinivîsim, hin caran gotar û rexneyê jî dinivîsim.




***Sedem û mebesta pirtûk û belgekirina jiyana hunermend Mihemed Şêxo çi ye?**

Min û Beha Şêxo di sala 1995an de, li ser daxwaza hezkiryên Mihemed Şêxo pirtûka "Stranên Mihemed Şêxo" çap kir. Mixabin ji ber tune bûna jêderan, û ji ber ku wek aniha Internet û derfeta pêwendiyan bi helbestvan û hunermendan re tune bû, gelek şaşî derketin, vêga, ji bo wan şaşiyan serrast bikim, min vê carê bi tenê barê amadekirina pirtûkê girt ser xwe. Di pirtûkê de mafê helbestvanan jî hatiye parastin. Min bi belge piştrast kiriye bê helbest û awaz yê kê ne. Her wiha min li bin gelek stranan, yên pirsgirêk li ser wan heye, şirove û encama lêkolîna xwe nivîsandiye, min nivîsandiye bê helbest û awaz yê kê ne. Dibe ku carinan şiroveya min şaş be, lêborînê dixwazim, lê yê/ya ku ji min baştir karibe belgeyan peyda bike û baştir şirove bike, fermo, rê vekiriye, ez jî dest û çavên wan maçî dikim.

***Te ji kengî ve dest bi nivîsandina li ser Mihemed Şêxo kiriye, mebesta min ev pirtûk e û belgeyên te ji ku hatine?**

Wek min di bersiva berê de got, ji 1995an ve, lê vê carê, hema hema pirtûkek din e, cuda ye. Pirtûk ji pêşgotinek dirêj, gotar, lêkolîn, hevpeyvîn, Note, portrêt, wêne û belgeyan pêktê. Hevpeyvînên bi Mihemed Şêxo re jî bûne, di pirtûkê de ne. Di pêşgotin û li bin hin stranan û di beşê wêne û belgeyan de, min belgeyên xwe diyar û eşkere kirine, min ew belge ji pirtûk, rojname, kovar û hevpeyvînan anîne, wek nimûne, helbest û awazên helbestvanê nemir Yûsifê Berazî, min bi axaftinên wî û bi hevpeyvînên bi wî re piştrast kiriye ku wî helbest û awazên xwe dane Mihemed Şêxo, neku Mihemed Şêxo eynî stranan ji hunermendekî din girtine. Her wiha min bi rêya postên hin kesan piştrast kiriye ku gelek caran derew û kedxwirî hatiye kirin, Ji bo helbestên nemir Kemal Şanbaz jî, min bi şirove û lêkolîn û belge piştrast kiriye bê helbest a kê ye û kê bi awaz kiriye. Pirtûk bersiva hemû pirsan dide.

***Derbarê stranên Mihemed Şêxo de gengeşeke berfireh derket, , we bi kesên xwedî ramanên cuda re têkilî danî, nemaze hunermendên ku doz li dijî stranên Mihemed Şêxo vekirine?**

Wek agahdar im, kesekî doz venekiriye, lê xwezî vekirina, newêrin vekin, ji ber ji xwe nebawerin. Hin kesên nexweş ûlawaz hene, ji wan weyê ku şerê Mihemed Şêxo kirin, yan jî ku sivikayetî bi Mihemed Şêxo kirin, wê mezin bibin, nizanin ku bi agir dilîzin û xwe dişewitînin. Newêrek in, li paş perdeyan şer dikin, her wisa di medya civakî de derew û bêwicdaniyê dikin û derfetê didin nezan û bêhişan xeber û sixêfan binivîsin, lê newêrin rû bi rûyê me bên. Min gelek name û bang bi rêya dostan ji wan re şandin û min got; wer in em biaxivin û vê meseleyê aqilane çareser bikin, ne tenê nehatin, dest bi êrîş û xeber û sixêf û şerê bêwate kirin. Mirovê xwedî maf be, natirse, tim li pêş e û bi mêranî li hemû meydanan doza mafê xwe dike.

***Di nivîsandina jînenîgeriya Mihemed Şêxo de zehmetiyên herî dijwar ên ku hûn pê re rû bi rû hatin çi ne?**

Bi texmîna min, jînenîgariya Mihemed Şêxo pirtûkek vekirî ye, bi dawî nayê, wê tim tiştên nû derkevin, ji ber Mihemed Şêxo di demên cuda de, li gelek welatan geriya û ma û jiyaye. Êdî, bi texmîna min navendek lêkolînan dikare xwedî li vê meseleyê derkeve, bişopîne û dikare bi salan dirêj bike. Min dikarîbû beşekî ji jînenîgariya wî tomar bikim, ne min tenê ev yek kiriye, hin cuwamêr û nivîskarên din jî li ser jiyana wî nivîsandine, wek rêzdar Mehmûd Begik û hin din, min hemû di pirtûkê de berhev kirine.



***Di pêşerojê de, gelo li ser hunermendên din ên ku mafên wan hatine talankirin belge bikin an binivîsin?**

Rasterast na, ezê wisa nekim, ji ber gelek sedeman. Karekî wisa bêtir yê navendên lêkolînan e, mirovek bi tenha xwe nikare karên wisa bike. Min ev yek ji M.Ş. re kir, ji ber taybetmendiya wî, û ji bo serrastkirina şaşiyên pirtûka 1995an, û ji ber M. Şêxo ji bo huner û gelê kurd gelek da, min jî hewl da giyanê wî bi pirtûkekê şad bikim.

***Projeyên te ji bilî vê pirtûkê çi hene?**

Belê, pirtûkek amade ye, ew jî lêkolîn e, di derbarê çîroka kurdî de ye, ji Şahmaran ta bi Tişîxofê Kurd ku Nûredîn Zaza ye. Qonaxên ku çîroka kurdî tê re derbas bûye, min hemû anîne ziman, min nimûneyek ji her cure û celebê çîrokê aniye û li ser şirove kiriye. Dema ji belav kirin û xirecira pirtûka Mihemed Şêxo rihet û vala bibim, ezê hewl bidim çap bikim.

***Gotina te ya dawî?**

Mala we ava, û bang li xelkên xwe dikim û dibêjim: pirtûkê bixwînin û bidin xwendin. Pirtûk dewlemend e. Her wiha dizanim ku wê şirove û belgeyên min, hinan bixeyidînin, bila bi wicdan û aqilane li meseleyê binerin, neku bi kîn û xeber û sixêf û gotinên li ser tenûran şerê min bikin, bila belgeyên xwe bidin pêş, û bila bên rû bi rû bi min re derkevin weşanên zindî, emê biaxivin, bi axaftin û aqilane hemû derî û pencere vedibin û hemû pirsgirêk çareser dibin, ne bi kîn û xeber û dijûnan. Ji xwendevanên rojnameya we, û ji hezkiryên xwe dixwazim malpera min www.qadoserin.com bişopînin daku, ji nêz ve min binasin. Dubare, mala we ava li ser vê derfetê, me jî bi rêya we dikarîbû xwe derbibirin û hin meseleyan zelal û ronî bikin. Serkeftin para we be.